YEKÎTIYA MAMOSTEYÊN KURD LI ALMANYAYÊ
&
VEREIN DER KURDISCHER LEHRER:INNEN IN DEUTSCHLAND E.V.



# Rêzekargeh ji bo Mamosteyên Dersên Zimanê Kurdî li Almanyayê

## Bihar, 2025

**Amadekar**
Komîsyona Perwerdehiya Navxweyî ya YMKê


**E-mail**
info@denge-mamoste.com

**Malper**
www.denge-mamoste.com

**Instagram**
@yekitiyamamosteyan

# Pêşveçûna Pîşeyî (Profesyonelî) û Nûjenî di Hîndekariya Kurdî de

Hîndekariya Kurdî li Almanyayê sal bi sal pêş ve diçe û her sal hejmara xwendekarên dersên kurdî û ya mamosteyan zêde dibe. Lê belê, derfetên perwerdehiya mamosteyên kurdî yên taybetî ji bo zimanê kurdî hêj jî gelek kêm in. Mamoste bi piranî li gorî derfetên xwe yên sînorkirî hewl didin ku ji bin zehmetî û astengiyên kar yên mîna çareserkirina mijara cudahiyên devokî, cudahiya di navbera zimanê nivîskî û yê devkî, kêmbûna materyalan û hwd. derkevin.

Mamosteyên zimanê kurdî beşdarî semînerên perwerdehiyê yên ji bo hemû mamosteyên dersên zimanê dayikê, dibin. Lê belê, gelek caran ev semîner ne li gorî pêdiviyên mamosteyên kurdî ne.

Semîner û kargehên ji bo mamosteyên kurdî jî ne li gorî rêbaz û bernameyeke domdirêj in, zêdetir li gorî pêdivî û derfetên demkî pêk tên. Di ser wan hemûyan de jî, mamosteyên kurdî her wiha mecbûr dimînin ku malbata razî bikin ji bo qeydên zarokan; li hemberî gef û siyasetên dewletên dijî kurdan û kurdî têbikoşin; xwendekarên ku astên wan ên zimanî gelek ji hev cuda perwerde bikin û hwd. Lewma, bernameyên domdirêj û xweyî bingeheke zanistî yên ji bo pêşveçûna pîşeyî (perwerdehiya navxweyî) yên taybetî ji bo hîndekariya kurdî li Almanyayê gelek girîng û hewce ne.

Wek komîsyona perwerdehiya navxweyî ya Komeleya Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK), em dixwazin vê valahiyê dagirin û bibin bersiv ji bo pêdivî û hewcedariyên mamosteyên kurdî li Almanyayê. Lewma jî em dixwazin bernameyeke salane ya rêzekargehan amade bikin û bi rê ve bibin. Ev bername dê ne tenê bibe platformeke ku derfetên xwepêşvebirinê pêşkêş bike, her wiha dê bibe alîkar ku mamoste ji hev û du jî hîn bibin, hevkariyeke xurt di navbera wan de çêbe û çavkaniyên xwe bi hev û du re parve bikin. Di vê bernameyê de pirsên bêbersiv dikarin li bersivên xwe bigerin, mamoste wek aktorên herî girîng dê bikarin hewcedariyên xwendekar û malbatên wan fehm bikin û hîndekariya zimanê kurdî pêş ve bibin.

# Armancên rêzekargehan

- Xurtkirin û pêşvebirina zanîn û şiyanên pedagojîk û pîşeyî yên mamosteyên kurdî bi rêya rêzekargehên ji aliyê pispor û kesên xwedî ezmûn ve.
- Avakirina hevkariyan di nav mamosteyan de ji bo ku praktîkên kêrhatî bi hev û du re parve bikin, stratejiyên nûjen ên hîndekariya zimanê dayikê hîn bibin, û bi hev re li ser materyalan bixebitin û wan pêşve bibin.
- Bilindkirina hişyariya heyî ya derbarê zehmetî û astengiyên li hemberî hîndekariya kurdî yên mîna guherînên devokî, kêmasiya materyal û bernameyên hîndekariyê, astengiyên siyasî, civakî û hwd.
- Afirandina platformeke domdar ku mamosteyên kurdî serpêhatî û zehmetiyên xwe bi hev û du re parve bikin da ku bikarin çareserî û bersivên hevpar ji wan re werin dîtin.

## Agahiyên rêzekargehan

Mehê carekê

Perwedehiya rexneyî

Online / Zoom

2 saet

# **Mijarên** Kargehan

## Cudahiyên Devokî û Ferqa Di Navbera Zimanê Nivîskî û Zimanê Devkî de (Dr. Michael Chyet)

Ji ber taybetiyên zimanê kurdî û civakezimaniya kurdan, cudahiyên di navbera devokên her zaraveyekî kurdî de gelek zêde ne û her wiha cudahiya di navbera zimanê devkî û zimanê nivîskî de gelek mezin in. Ev kargeh dê li ser vê mijarê be û dê were nîqaşkirin ka çawa ev mijar ne tenê astengiyek e, di heman demê de dikare bibe derfetek ji bo pêkanîna praktîkên nûjen û rexneyî. Dê stratejiyên ji bo praktîkên di vê mijarê de werin nîqaşkirin.

## Zimanê Standart/Standarkirin di Hîndekariya Kurdî de (Dr. Michael Chyet)

Her çiqas zimanê kurdî ji aliyê standardizasyonê de qedereke pêşketî jî be, gelek mijarên vekirî jî ji bo nîqaşê hene. Mijarên wek: Navên mehan bi Kurdî; Ferhengsazî û ferhenga min (Ferhenga Birûskî); Etîmolojî (Koknasî)ya hejmaran; Paşeroj û ne pêşeroj -- û çima?; Etîmolojîya peyvên ji Ermenkî; Etîmolojîya peyivên ji Sûryanî; Etîmolojîya peyivên Hindo-Ewrûpayî bi Kurdî; Bandora zimanê Tirkî li ser Kurdî; û Çend gotinên pêşîyan yên hezkirî.

## Hîndekarî û Materyalên Xweyî Hişyariya Zayendî (Münevver Azizoglu-Bazan)

Hişyariya Zayendî di hîndekariya ziman û materyalan de tê çi wateyê? Di hîndekariya kurdî de rewşa hişyariya zayendî çi ye? Mirov çawa dikare di mamostetiya xwe de bi xweyî hişyariya zayendî pêk bîne? Armanca vê kargehê dê bersivandina pirsên bi vî rengî bin.

## Bikaranîna Materyal û Çavkaniyên Dijîtal (Dr. Şehmus Kurt)

Ew ê mijarên wisa werin pêşkêşkirin û nîqaşkirin: Di pêvajoya hînkirina zimanî de cih û rola materyalan û hilbijartina materyalan ji bo hînkirinê. Mamoste çawa dikarin materyalên heyî li gorî ast û pêdiviyên xwendekarên xwe bi kar bînin? Kîjan derfetên materyalên dijîtal hene? Mirov çawa dikare materyalên dijîtal bi kar bîne?

## Mamostebûn û Mamostetiya Kurdî (Şerif Derince)

Dê pêşkêşiyek di derbarê taybetiyên mamostebûn û mamostetiya kurdî de were kirin ku beşdar rol û rewşa xwe bi perspektîfên zanistî û çarçoveyeke pedagojîk beştir fehm bikin. Dê li ser mijara astengiyên polîtîk yên ji welatên serdestên kurdan û bandor/hevkariya wan ya bi Almanyayê re û her wiha stratejiyên ku mamosteyên kurdî çawa van astengiyan radikin werin pêşkêşkirin. Dê beşdar serpêhatî û perspektîfên xwe parve bikin û rêbazên hevkariyê li hemberî van astengiyan werin nîqaşkirin.

# Bername

**Format**: Her kargehek  ji du beşan pêk tê.

**Beşa Pêşkêşiya Pisporî (qasî saetekê):** Ew ê ji bo her kargehê pisporek di warê mijara kargehê de were vexwendin ji bo ku bingeha pisporî ya mijara kargehê pêşkêş bike û bingehekê ava bike ku nîqaş û xebat li ser were kirin.

**Nîqaş û xebata piratîk (qasî saetekê):** Dê beşdar di nav komên piçûk de bi hev re bixebitin da ku fikrên çareserî an jî mînakên kêrhatî ji bo mijara hatiye pêşkêşkirin biafirinîn. Dê encamên kargehan werin qeydkirin, dokûmantasyona wan were kirin û bi beşdaran re werin parvekirin.

| Dem | Mijar | Semînerdar |
|---|---|---|
| 24 Sibat 19:00-21:00 | Cudahiyên Devokî û Ferqa Di Navbera Zimanê Nivîskî û Zimanê Devkî de | Dr. Michael Chyet |
| 24 Adar 19:00-21:00 | Zimanê Standart/Standarkirin di Hîndekariya Kurdî de | Dr. Michael Chyet |
| 28 Nîsan 19:00-21:00 | Hîndekarî û Materyalên Xweyî Hişyariya Zayendî | Münevver Azizoglu-Bazan |
| 26 Gulan 19:00-21:00 | Bikaranîna Materyal û Çavkaniyên Dijîtal | Dr. Şehmus Kurt |
| 23 Xezîran 19:00-21:00 | Mamostebûn û Mamostetiya Kurdî | Şerif Derince |

## Encam

- Dê beşdar zanîn û şiyanên xwe yên pedagojîk xurt bikin, taybetî di hîndekariya kurdî de.
- Dê platformeke dijîtal derkeve ku tê de materyalên di nav kargehan de hatine amadekirin, çalakî û stratejiyên dê bên nîqaşkirin û pêşkêşkirin werin berhevkirin û belavkirin.
- Dê hevkariya di navbera mamosteyên dersên kurdî de xurttir be, bingeha hevkariyên nû pêk were.
- Dê xwebawerî û kapasîteyên mamosteyên zimanê kurdî ji bo xurtkirin û pêşvebirina hîndekariya kurdî di pol, dibistan û bajarên xwe de pêşve biçin.

# Beşdarî

## Hinek agahiyên girîng

- Ev bernameya rêzekargehan zêdetir ji bo mamosteyên dersên zimanê kurdî li Almanyayê hatiye amadekirin. Lê belê, mamosteyên kurdî yên li welatên din ên dîasporayê jî dikarin beşdar bibin.
- Bername tenê ji bo mamosteyên kurdî ye.
- Beşdarbûna bernameyê bêpere ye.
- Saetên kargehan li gorî dema Almanyayê ne.
- Mamosteyên qeydên xwe çêdikin, divê beşdarî hemû kargehan bibin.
- Li dawiya bernameyê, dê beşdarname were dayîn.

# Têkilî

**Malper**
http://denge-mamoste.com/

**Email**
info@denge-mamoste.com

**Instagram**
@yekitiyamamosteyan

**Serlêdan**
xhttps://forms.gle/AFmdEMaPmq4Vt3QR6